 

*Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

*wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî**
**Xelek 35**

# 1 - Gengeşî li ser rola Selaheddînê Eyûbî

## Jinavbirina kesayetiya Selaheddînê Eyûbî?!

Sala 2003-an bû, Amerîka wê hîngê êrişên siq û gurr dibirin ser leşkerê dîktatorê îraqî *Seddam Huseyn*; û herdu partiyên sereke yên Başûrê Kurdistanê (PDK û YNK) bi dijberiya Şî'î ra li Îraqê li gel Amerîka hevpeyman li dijî sazûmana Ba'sî nijadperest danîbûn. Di wê demê da netewperestên Ereb di bahoz û buhraneka ramanî û derûnî tûj da dijyan û derbas dibûn. Li gor wan *Seddam Huseyn* qehremanekî neteweyî bû û jinavbirina serdariya wî dihat maneya şikestina rawestana erebî ya petî û ji holê birina rûmet û payedariya erebî.

Rojekê ji wan rojan, ez û hin hevalên xwe yên erebbûyî, em bi otombîlê diçûn cihê xwe yî kar li zanîngeha welatekî Kendava Farisî. Helbet, ev êrişa Amerîkî li ser Îraqê mijara axaftina hemiyan bû. Hevalekî minî doktor ji welatê Urdinê (M. Ş.) ji min pirsî û got:

- Çima Kurd li gel Amerîka radiwestin?

- Heger ez li cihê wan Kurdan bama, minê jî wisa bikira. Ev bûn ewqas sal Kurd û sazûmana îraqî şerê hev dikin; Kurd mafên xwe dixwazin, sazûmana îraqî jî napejirîne, wan seza dike û çekên kîmyawî li dijî wan li Helebçe pêkanîn. Gelo ma tê aqilan ku Kurd piştgiriya celladên xwe bikin?!

- Bi navê Xwedê ya doktor divêt em *Selaheddînê Eyûbî* ji nû va binirxînin. Me zarokên xwe wisa perwerde dikirin ku ji wî hezbikin. Ji lewra, divêt em vê mijarê ji nû va binirxînin.

Bi rastî ev axaftina hevalê minî doktor (M. Ş.) ji Urdinê, ji min ra nagihan bû. Tiştê ku dihate zanîn, pir welatên Ereban jî wê hîngê li gel Amerîka hevpeyman bûn li dijî *Seddam Huseyn,* û balafirên Amerîkî ji baregeha *El-Udeyd*, ji Îmareta Qeter hildifiriyan û li hêzên îraqî didan. Lê tevî vê rastiyê jî, hevalê min negot ku pêwîste em rêberên Ereban yên dîrokî ji nû va binirxînin. Tenha, ji ber ku hin Kurdên Başûr li gel Amerîka hevpeymanin û li dijî celladê xwe ne, hevalê minî doktor enirî ye û dixwaze *Selaheddîn* ji xeleka rêzgirtin û hezkirinê rake; tevî ku destkeftiyên *Selaheddînê Eyûbî* ji Ereban ra bi taybetî û ji Misilmanan ra bi gelemperî pêşkêş kirine bi ti nirxan nayên pîvan.

## Çepelkirina Jînenîgariya Selaheddîn:

Piştî dora sê salan û dîsa li wî welatê Kendavê, rojekê du hevalên sûrî yên erebbûyî li xwaringehekê mêhvanên min bûn. Yê pêşî doktorekî Sunnî ye (M.F.Z.) û di babeta perwerdeyê da dixebite û yê din doktorekî Elewî ye (Ȟ.M.) di babeta bijîşkiyê da dixebite. Em di axaftinekê da bûn dûr ji mijara Kurdan. Ji nişkan va Sunniyê erebbûyî berê xwe da min û got:

- Niha gengeşiyek derbarê *Selaheddînê Eyûbî* heye û ez dixwazin baweriya te di vê mijarê da zanibim.

- Min got mijar çi ye?

- Dibêjin ku *Selaheddîn* Dewleta Fatîmî ji holê rakiriye û ev yek bi wî ne bes bû, malbata Fatîmî jî, ya li Misirê serdar, bi tamamî qirkiriye.

Ev mijar êdî ji bo hevalê Elewî jî bû mijareka balkêş. Rabû got ku helwesta *Selaheddîn* ji Fatîmiyan bi rastî gelek balkêşe û divê mirov bi rastî bide pey vê pirsê. Ji min va hate xuyakirin ku evên erebbûyî, Sunnî dibe yan Elewî, herdu li ser înkarkirina helwesta *Selaheddîn* xwedî yek ramanin. Min ji hevalê Sunnî ra got:

- Bes *Selaheddîn* neçar ma ku Dewleta Fatîmî ji holê rake û ne bi vîn û îradeya wî bû.

- Ev çawa ye ku tu dibêjî: Ew neçar bû û ne bi vîna wî bû?

- *Selaheddîn* wê hîngê ne sultanê Misirê bû, ew wezîrê xelîfeyê Fatîmî yê dawî *El-Adid Lî Dînîllah* û li Misirê cihgirê sultanê Turkumanî *Nûreddîn Zengî* bû, yê ku li Şamê serdarî dikir. Ji lewra, ew ne xwediyê biryara ji holê rakirina Dewleta Fatîmî bû û ne jî yê qirkirina malbata Fatîmî ya serdar bû. Wî tenha fermanên ku jêra dihatin bi cih dihanîn. Heya ku jê hat ev ferman bi awayekî mirovane pêkhanîn û bi zirareka here kêm.

- (Bi awayekî matmayî) Gelo ev raste? Ev cara yekeme ku ez van agahdariyan dibihîsim.

- Ka vegere ser jêderên dîrokî. Tu yê bibînî ku *Selaheddîn* wê hîngê ne sultan bû. Ji lewra, ew ne berpirsiyare ji ber tiştê ku bi serê Dewleta Fatîmî û malbata Fatîmî hat. Berpirsiyarê yekser xelîfeyê Ebbasî *El-Mustedî' bî Emrîllah* bi xwe ye. Wî ji sultan *Nûreddîn Zengî* xwast ku xîlafeta Fatîmî ji holê rake û wisa sultan *Nûreddîn* ferman şand ji *Selaheddîn* ra ku bi zûtirîn dem vê fermanê bi cih bîne. Û gava *Selaheddîn* hinekê rawestiya û yekser bi cih nehanî, sulatan *Nûreddîn* gef lê xwarin, hîngê *Selaheddîn* neçar ma ku fermanê bi cih bîne.

Hevalê Sunnî pir matmayî ma û got: Hin pirtûk û gotarên nû hene ku di wan da êrişê dibin ser *Selaheddîn*. Ez hêvîdikim ku tu pirtûkekê binivîsînî û tu van mijaran şîrove bikî. Min soz dayê û got: Min gelek agahdarî li ser *Eyûbiyan* di pirtûka "*Dîroka Kurd di heyamên Îslamî da*" civandine. Ez hêvîdarim ku ezê ji pêra pirtûkekê li ser *Selaheddîn* û Dewleta Eyûbî jî biweşînim.

Di vê derbarê da dixwazim bêjim ku di nîveka dehsalên nodî yên sedsala bîstan da, min di kovara (El- Erebî) da ku li welatê Kuweyt çapdibe û li welatên Ereban û welatên erebbûyî pir belav dibe, gotarek dît, sernivîsa wê "*Seleheddînê Eyûbî: Baweriyeka din*" bû. Yan jî bi vê maneyê bû. Di wê gotarê da nivîskar *Hesen El-Emîn* hewldide ku wêneyê *Selaheddîn* çepel bike, pêkanînên wî yên leşkerî û şaristanî veşêre û wî bike berpirsiyarê bûyerên ku bi serê Xîlafeta Fatîmî hatin. Di pey ra, min pirtûkeka wî nivîskarî bi sernivîsa "*Selaheddînê Eyûbî di navbera Ebbasî, Fatîmî û Xaçeperestan da*" dît ku di wir da jî, bi ferehî li ser wê şopê çûye.

Bi giştî, *Selaheddîn* bûye armanca du komên rewşenbîrên erebbûyî:

- Sunniyên erebbûyî yên neteweperest, ewên ku ketine bin bandora hestên nijadperest û ji Kurdan bi kînin, ji ber ku ew mafên xwe yên neteweyî dixwazin û hêvîdikin ku dewleta xwe li ser axa welatê xwe Kurdistan avabikin. Wek derbirîna vê kîna li ser Kurd, evên erebbûyî dixwazin keda *Selaheddîn* di bergiriya gelên Rojhilat da û li dijî talanên Firengî înkar bikin, tevî ku heya niha ew *Selaheddîn* di pirtûkên xwe yên dibistanî da wek "*Qehremanê Ereb*" bi navdikirin.

- Şî'e, Elewî û Îsmaîliyên erebbûyî jî kîna wan li ser *Selaheddîn*'e wek encama tevlêbûna hestên neteweperest li gel hestên olî (mezhebî). Ew dibînin ku *Selaheddîn* berpirsiyarê ji holê rakirina Xîlafeta Fatîmî ye.

*Selaheddînê Eyûbî* - di gora xwe da li Şamê, dûr ji Kurdistanê - ne tenha bûye armanca êrişên evên erebbûyî, lê hinek ji Kurdan jî êdî destpêkirine êriş wî dikin û wî wek xizmetkarê Ereban dihejmêrin û dibêjin ku wî pir kêmasî kiriye û dewleta kurdî ya serbixe avanekiriye.

Gelo rastî li kû ye?